



## Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2021  
Sayı/Hejmar/Issue: 3  
e-ISSN 2717-8315  
Rûpel/Sayfa Page: 11-25



Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:  
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research  
Article

Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received:  
02.06.2021

Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/  
12.06.2021

Ömer Delikaya. MEB, Xwendekarê Doktorayê,  
Ziman û Edebiyata Kurdî, Zanîngeha Bîngolê,  
omerdelikayaa@gmail.com.  
Orcid: 0000-0001-6505-5107

M. Zahir Ertekin. Doç. Dr., Zanîngeha Bîngolê,  
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, zahirertekin@  
hotmail.com  
Orcid: 0000-0003-3519-9892

Atf/Citation: Delikaya Ö, Ertekin, M. Z. (2021).  
“Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî: Topogeny û Nexşeya  
Devkî di Kilama Elî Xarza de”, Kurdiyât, 3, 11-25.

# “LI GELIYÊ ÇATÊ TAV DIZIRIQÎ”: TOPOGENY Û NEXŞEYA DEVKÎ DI KILAMA ELÎ XARZA DE

Ömer DELİKAYA - M. Zahir ERTEKİN

## Kurte

Navê cihan, bi wateyên xwe yê sosyo-çandî û sembolîk ve, bi fonksiyona xwe ya bîranîna raborî û veguhastina çanda devkî ve parçeyekî bi qîmetê mîrasa çandî ne. Nav tenê bi taybetmendiyên xwe yê dewlemend ên bîbîxistinê ve di jiyana rojane de ji bo merivan bi rola xwe ya civakî ranabin, herwiha ew di dewamdariya nasnameya çandî de jî roleke giring digêrin.

Têgeha ‘topogeny’yê ku ji aliyê James Fox ve hatiye dariştin, ji bo wan cure vegêranan tê bikaranîn ku bi rengekî seredorî navê cihan tê de rêz dibin û vegêranên wihareng di hin kilamên kurdî de jî tên dîtin. Ev vegêranên topojenîk ku di çanda devkî ya kurdî de tên dîtin, zanînen çandî û dîrokî destedewrî nifşên nû dikin û wan li ser erdê dineqîşînin. Di vê çarçoveyê de, ev xebat ku cextê dibe ser vegêranên dîrokî û topojenîk ên ku bi rêya navan li ser erdê tên kodkirin û wekî nimûne kilama dirêj a bi navê “Elî Xarza” dinirxîne. Ev kilam li ser qewimîneke dawîya sed-sala 19an hatiye gotin ku tê de Hemze Beg (xal) lê dixebite Elî (xwarzî) ji destê eskeran xelas bike ku wê demê mehkûm/girtî bûye. Rev û rêwitiya di kilamê de ya ku ji Makûyê heta Erziromê bi awayekî seredorî tê vegêrandin û strandina navê gund, bajar, çem û zozanan pêk tê, nimûneyeke wê diyardeyê pêk tîne ku Fox wekî “topogeny”yê bi nav kiriye.

**Peyvên Serekî:** Topogeny, Toponîm, Navê Cihan, Dengbêj, Kilam, Kurdî, Nexşeyên Devkî

\* Ev nivîsar xwe dispêre beşeke teza doktorayê ya Ömer Delikaya ku wekî “Venavandina Cihûwaran li Komara Tirkiyeyê: Mînakê Agiriyê” hatiye amadekirin.

## “Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: ‘Elî Xarza’ Kılıamında Sözlü Harita ve Topogeny

### Özet

Yer isimleri; sahip oldukları sosyo-kültürel ve sembolik anlamları, geçmişi hatırlatma ve sözlü kültürü taşıma işlevi ile kültürel mirasın değerli bir parçasıdır. İsimler, insanlar için günlük hayatta sadece zengin çağrışımsal özellikleriyle sosyal rollerini sürdürmekle kalmaz; aynı zamanda kültürel kimliğin devam etmesinde de önemli bir rol oynar.

Kürt sözlü anlatılarında, özellikle de *kılam*larda yeradları önemli bir yere sahiptir. Kürtçe kılıamlarda yeradlarıyla oluşan sözlü haritalar ve anlatı biçimleri yer almaktadır. Bu çalışmanın amacı Kürt sözlü kültüründe yeradlarının üstlendikleri rol ve fonksiyonları ortaya çıkarmaktır. Yeradlarının hikayenin mekansal akışına göre ard arda dizilmesi ile oluşan, James Fox’un *topogeny* olarak adlandırıldığı icra biçimi bazı Kürtçe *kılam*larda da görülmektedir. Kürt sözlü anlatılarında ortaya çıkan bu topojenik anlatı formları kültürel ve tarihsel öneme sahip bilginin aktarılması ve mekana kodlanması işlevi görür. İsimler yoluyla mekâna işlenen tarihsel ve topojenik anlatıların önemine vurgu yapan bu çalışma, 19. yüzyılın sonlarında cereyan eden Elî adlı mahkumun kaçırılmasını konu edinen “Elî Xarza” (Yeğen Ali) adlı uzun *kılamı* incelemektedir. Kılıamda İran’ın Makü kentinden Erzurum’a kadar uzanan yolculuğun sırayla dizilen köy, kasaba, nehir ve yayla adlarıyla anlatıma katkı sunması Fox’un Avustralya dillerinde yer alan bazı anlatı formları için oluşturduğu *topogeny* kavramıyla açıklanmaktadır.

**Anahtar Sözcükler:** Topogeny, Toponim, Yeradi, Dengbêj, Kılıam, Kürtçe, Sözlü Harita

## “Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî”: Topogeny and Verbal Maps in the Kilam of ‘Elî Xarza’

### Abstract

Place names are a valuable part of cultural heritage with their sociocultural and symbolic meanings, the function of reminding the past, and carrying oral culture. Names not only maintain their social roles for people in daily life with their rich associative features, but also play an important role in the maintenance of cultural identity.

Place names have a significant place in Kurdish oral narratives, especially in *kilams* (a kind of Kurdish folkloric song). Kurdish *kilams* involve ‘oral maps’ and narrative forms created by place names. This study aims to reveal the roles and functions of the place names in the Kurdish oral culture. ‘Topogeny’, the term coined by James Fox to refer an ordered succession of place names in regard to spatial flow of the story, is seen in some Kurdish kilams. Topogenic narrative forms emerged in Kurdish oral narrations function as transmitting the knowledge that has cultural and historical importance, and encoding that knowledge on the space. This study, which emphasizes on the importance of historical and topogenic narrations treated through the names, examines the long *kilam* «Eli Xarza» (Eli the Nephew, include 160 place names) whose topic is on the breaking out of prisoner Eli in the later 19th century. The travel from Maku city of Iran to Erzurum through which the names of the villages, towns, rivers and highlands are sung and narrated in an ordered sequence is an example of what Fox has named a ‘topogeny’.

**Keywords:** Topogeny, Toponyms, Place names, Dengbêj, Kılıam, Kurdish, Oral Map

## Destpêk

Navê cihan an jî toponîm<sup>1</sup> xwedî gelek wateyên sosyo-çandî û sembolîk in. Ew li milekî wekî mîrîsa çandî ya merivan bi taybetmendiyên xwe yê bibîrxistinê ve di jiyana rojane de rola xwe ya civakî digêrin, li milekî din erka dewamdariya nasnameya çandî digirin ser xwe. Cihênav derheqê şûn û şopa dîrokî ya paşxaneyê cihekî û gelên wir ên xwecih de dikare agahiyên bikêr pêşkêş bike ji ber ku ew ji aliyê zanyariyên çandî yê li ser cografya, dîrok, danûstandin û nirxên çandî ve dewlemend e. Ji ber girêdana wan a necudabar a bi hin pêgehên diyar heye, navê cihan dikarin gelek bibîrxistinên zihnî û hestî binin bîra meriv; bibîrxistinên dem û mekan, ên dîrok û qewimînan ên meriv û çalakiyên civatî ên takekesî û merhaleyên di jiyana kesekî de.<sup>2</sup> Cihênav an jî toponîm ji ber van taybetmendiyên xwe yê neteweyî û nasnameyî ji aliyê desthilatê ve dibe armanc û rastî destwerdanê tê. Herwiha nav û binavkirin di destê desthilatê de dibe ew amraza ku pê dawaya xwedîtiyê (*claiming ownership*) tê kirin.<sup>3</sup> Bi qewlê Michel de Certeau “her desthilat toponîmîk e û lê dixebite bi binavkirinê ve pergala xwe ya cih ava bike”<sup>4</sup>

Rast e cihênav hem ji bo civakê giring e hem jî ji ber wateyên xwe yê nasnameyî, neteweyî û civakî bala desthilatê dikişîne ser xwe û car caran rastî guhertinan tê. Ji bilî van, cihênav ji bo vegêranên devkî (*oral narration*) jî rola xwe ya estetîk, stîlistîk û sembolîk digêre. Ew bi tecrîbe, cihanbînî û feraseta gel re çêdibin û bi demê re dibin xwedî çîrok û serhatî. Bi taybetî pabendî û têkiliya ku folklorê kurdî bi cografya û navên cografîk re çêkiriye, dikare bi nêrîneke mekanî, navnasî, civatî, etno-ekolojîk ve bê ron û eşkerekirin. Çawa ku tê zanîn bi deng û kilamên xwe ve dengbêjan, bi sedan salan tevkarîyeke mezin li çanda kurdî kirine û guhê xwe dane ber hemû qewamên ku bo civata wan girîng in û bîra raboriyê veguhastine dema me ya îroyîn. Ji ber ku dengbêj tim li ser rê û dirban e û cografya û toponîmên herêma xwe ya lokal hîn dibe. Ew ne tenê zanîneke toponîmîk a xurt bi dest dixê, di heman demê de vê zanîna xwe tev li vegêranên xwe yê hunerî dike û wan (ve)digerîne. Ji ber hindê, gelek kilamên kurdî ji aliyê toponîman ve dewlemend in û hin taybetmendiyên xweser nîşan didin ku hêjayî lêhûrbûnê ne. Li dor çarçoveya li jor diyarkirî ya li ser giringiya nava, ev xebat dixwaze hin form û wateyên navê cihan di nav kilamên dengbêjan de destnîşan bike û nirxê wan ên ji bo çanda devkî ya kurdî raxe ber çavan. Bi vê armancê, ev xebat li ser kilama bi navê “Elî Xarza” hûr dibe û di vê kilamê de nexşeyên devkî û “topogeny”yê vedikole. Şaxa kilamê ya ku di vê xebatê de tê nirxandin ji aliyê Nihat Gültekin ve hatiye berhevkirin.<sup>5</sup>

### 1. Navê Cihan û Nirxê Wan ji bo Zanîna Gelêrî

Xebatên li ser navê cihan (toponîm) li gelek welatên cihanê bi pêş ketine. Navê cih û erdan

- 1 Toponîm an jî navê cihan, bi îngilîzî *placename / toponym*, bi tirkî wekî *yeradı / toponim* tê bikaranîn ku meriv bi kurdî dikare wekî “cihênav” jî bi nav bike. Toponîm wekî çemkekê ji peyvên yewnanî *tópos* (cih) û *ónoma* (nav) pêk tê. Wekî ku ji wateya peyvê ve jî dertê holê navên cihan babeta serekî ya toponîmiyê ye. Toponîmî an jî cihênavnasî, zanista navên cihan e ku bi îngilîzî wekî *toponymy* an jî *toponomastics*, bi tirkî wekî *yeradbilim* tê zanîn. Ew binbeşeke onomastîkê ye ku bi giştî hemû navên cihan (toponîm) vedikole. Onomastîk jî binbeşeke zimannasiyê ye ku tê de hemû cure serênava (*proper names*) û toponîm –serênavên ku têkildarî erdê ne – tên vekolîn.
- 2 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996), 76.
- 3 Lawrence D. Berg - Robin A. Kearns. “Naming as norming: “Race”, gender and the identity politics of naming places in Aotearoa/New Zealand”, ed. Lawrence D. Berg -Jani Vuolteenaho *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming* (Aldershot: Ashgate, 2009), 19; Keith Basso, “‘Speaking with Names’: Language and Landscape among the Western Apache”, *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130.
- 4 Michel de Certeau. *The Practice of Everyday Life*. trans. Steven Rendall, (Berkeley: University of California Press, 1984), 130.
- 5 Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* (Stenbol: Avesta, 2013), 215-226.

heta niha hem ji aliyê nîrxê xwe yê etnografîk ve hatine vekolîn hem jî cihê wan ê di nav nerîta devkî de hatine hilsengandin.<sup>6</sup> Herwiha, bi rengêkî dîrokî xebatên etnografîk ên ku wekî parçeyê-ke çanda civatî bala xwe didin ser navan, vedigere heta destpêka sedsala 20an. Xebatên ewil ên di vê qadê de ji aliyê Franz Boas ve hatine kirin ku ew wekî "bavê antropolojiya Amerîkayê" bi nav û deng bûye.<sup>7</sup> Boas piştî ku li ser navê cihan ên di nav xwecihên Amerîkayê de xebatên xwe yên ewil<sup>8</sup> dike kartêkeriyê mezîna çêdike li ser peyrevên xwe ku qismek ji wan xwendekarên wî bûn. Yek ji wan kesên herî giring ê hevçerx Keith Basso ye<sup>9</sup> ku balê dikişîne ser rehendê etnografîk û antropolojîk ê navan. Basso bi gelek xebatên xwe<sup>10</sup> yê li ser têkiliya navên cihan û çanda xwecihan, vekolînên sehayî meşandine û rehendê çandî yê navan di nav xwecihên Amerîkayê de nîşan daye. Dîsan, pey Basso re eleqeyê berçav di nav zimannasên antropolog de, bi taybetî di nav xwendekarên wî de belav bûye. Bi taybetî cihetên sembolîk ên navê cihan, rola navan di veguhastina çand û baweriyê de, fêrkirina rabûn-rûniştinên li gorî exlaqê û hin adetên gelêrî yê bi vî warî re têkildar hatine vekolîn. Keith Basso di kitaba xwe de ya bi navê *Wisdom Sits in Places* [Ferasetê li Erdê Hêwir Daniye]<sup>11</sup> qedera sî salî di nav xwecihên amerîkî –apaçî– de li ser nexşekirina navê cihan dixebite û ji gelek cihetan ve di wê lêgerînê de ye bê ka navê cihan bi çi rengî di nav wî gelî de hatine saz kirin û binyada zimanê wan çendî bandora xwe heye li ser beşkeririna wan a ji erdê. Piştî van xebatên navbirî yê pêşeng, ev qad bi beşdariya gelek xebat û vekolînên din, bi pêş ketiyê û lîteratureke xurt li ser vê qadê ava bûye. Li ser navê cihan ango toponîman û li ser têgihiştina merivan ji erdê bi rêya navan, gelek xebat li vê qadê zêde bûne di nav gelên cuda de.<sup>12</sup> Ev xebat destnîşan dikin bê ka fêrbarî û têgihiştina li ser navan ji bo her gelekî bi çi rengî diguhere û vegêranên devkî çawa têkilî û pabendiyê bi erdê re saz dikin. Lewma, pêdivî pê heye cihên di nav xebatên vê qadê de bi rengêkî pir-rehendî bê vekolandin. Gelek xebatên vê qadê bi rengêkî eşkere nîşan didin ku kom û cewawerek diqewime ku li ser erdê xwe û bi navê wî erdî re wateyê xweser ava bikin. Di vê pêwendê de, Basso radigihîne ku navê cihan di ferhenga hemû zimanên nasyar de, birîtî ye ji milkên wateyî (*semantic domain*) ên cuda û taybetmendiyên fermî yê sîstema navê cihan bi tevî girêdanên mekanî û etîmolojiyên dema borî, ji mêj ve bûye babeta lêgerînên antropolojîk. Lêbelê li gorî wî, çalakiya gişgir a cihnavandinê

6 W. F. Nicolaisen, gelek xebat kiriye li ser navan û wateyên wan. Wî bi taybetî rol û fonksiyona navan vekole di vegêranên devkî û nivîskî. Ji bo xebatên wî, bin. W. F. H. Nicolaisen, "Field-work in place-name research", *Studia Hibernica* 1 (1961), 74–88; W. F. H. Nicolaisen, "Place-names in traditional ballads", *Folklore* 84 (1973), 299–312; W. F. H. Nicolaisen, "Names as Verbal Icons", *Names* 22/3 (1974), 104–110.

7 Ji bo rol û pêşengiya wî di xebatên li ser navan de, bin. Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", *American Indian Quarterly* 21/2 (1997), 209–228.

8 Franz Boas, *Geographical names of the Kwakiutl Indians* (New York: Columbia University Press, 1934).

9 Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", 209.

10 Keith Basso, "Speaking with Names": Language and Landscape among the Western Apache", *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130; Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996).

11 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996).

12 Bo nimûne, bin. Keith Basso, "Speaking with Names": Language and Landscape among the Western Apache", *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130; Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache* (Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996); Julie Cruikshank, "Getting the Words Right: Perspectives on Naming and Places in Athapaskan Oral History", *Arctic Anthropology* 27/1 (1990a), 52–65; Julie Cruikshank, *Life lived like a story: Life stories of three Yukon native elders* (Vancouver: University of British Columbia Press, 1990b); Thomas Thornton, "Anthropological Studies of Native American Place Naming", *American Indian Quarterly* 21/2 (1997), 209–228; Thomas Thornton, *Being and place among the Tlingit* (Seattle: University of Washington Press, 2008); Eugene Hunn, "Columbia Plateau Indian Place Names: What Can They Teach Us?" *Journal of Linguistic Anthropology* 6/1 (1996), 3–26; James Kari - James A. Fall ed. *Shem Pete's Alaska: The Territory of the Upper Cook Inlet Dena'ina* (Fairbanks, AK: Alaska Native Language Center, University of Alaska, 2003); Steven Feld. "Waterfalls of Song: An Acoustemology of Place Resounding in Bosavi, Papua New Guinea", ed. Steven Feld - Keith Basso *Senses of Place*. pp. 91–135. Santa Fe, NM: School of American Research Press, 1996.

(*placenaming*) –bikaranînên navê cihan di nimûneyên berçav ên xeberdana rojane de– gelek bi kêmî bala zimannas û etnografan kişandiye.<sup>13</sup>

Navên cihan ku ji bo civatekê nisbeten bi rengekî kêmîtir giring bê dîtin jî, bi pêçevane, ji bo civateke din dikare bibe werçerxa bibîrxistina dîrok, efsane û vegêranên din ên devkî. Wate, navê cihan ji bo her civatê wateyeke xwe ya xweserî xwe heye û diqewime ku hin taybetmendiyên resen nîşan bide. Ji ber vê yekê ye ku xebatên li ser navê cihan, derheq çand, dîn, dîrok û folklorê gelekî de dikarin bi xwe re teferûatên balkêş û kêmpêyda bînin ber zanîna merivan.

## 2. Dengbêj(i) û Gera Wan a Daimî

Dengbêjî bi terîf û şiroveya navê xwe ve cextê dibe li ser deng û bêj(i)yê. *Deng*, îşaretê bi wê deqa devkî ya hunerî dike ku bi *bêjê* ve dibe meqamê ku tê vegêrandin. Bi vî awayî, îcrakirina performansa dengbêj a vegêraneke hunerî li ser du tiştên esasî ava dibe: çîrok (*deng*) û performansa wê ya hunerî ya vegêranê (*bêj*). Bi taybetî ev du deheyên dawî dengbêjî dibe mijara gelek xebatên akademîk û berhevkarîyê ku tê de li ser jiyan û kilamên wan agahî tînin dayîn<sup>14</sup>. Ji ber hindê, li ser dengbêjî û vegêranên wan ên hunerî li vir hewce nake ku babet dirêj bibe. Lê ji ber ku xebata berdest li ser navê cihan radiweste, pêdivî pê heye ku meriv li ser wan taybetmendiyên kesê dengbêj raweste ku bi xêra wan dibin xwedî zanîneke xurt a toponîmîk.

Dengbêj bi gerokbûna xwe ve mînanî mêşa hingiv ji gelek der û deveran qiset û çîrok, serhatî û qal û qewimînan hîn dibe. Ew, bi van gerên xwe ve ku bi gelemperî wekî parçeyê karê wî bi xwe ye, -beşdariya li şahiyên, danîna kirîvatiyê û dawet- li ser cografyaya xwe ya fîzîkî û çandî gelek agahî û zanînen kûr bi dest dixê. Ji ber karên xwe dengbêj tim di nav civatê de li dawet û şahiyên digere û gund namîne ku ziyaret nekiribe.<sup>15</sup> Dengbêj ji dawetekê ji bo yeke din, ji gundekî bo gundekî din tim rêwî ye û erdnîgariya xwe ya lokal bi tevî çiya, newal, gund, zozanan ve baş hîn dibe. Ew tenê nabe şarezayê nav û nîşanên cografyaya xwe, herwiha ew di çarçoveya devera xwe ya lokal de serdana gundan dike û li hin gundan çend rojan kilaman dibêje.<sup>16</sup> Ew di van gerên xwe de, nîrx û normên civatî, kesayetên giring ên civatê nas dike. Çûnûhatina dengbêj tenê bi gundên derdorê re bi sînor nebû, hin dengbêjan bi malbatî koçî gund û navçeyên cuda dikirin û

13 Keith Basso, *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache*, 76.

14 Salihê Kevirbirî, *Filîtê Quto* (Stenbol: Do, 2009a); Salihê Kevirbirî, *Sedsala Qêrînekê: Karapetê Xaço* (Stenbol: Do, 2009b); Metin Yüksel, *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960* (University of Chicago, Unpublished PhD Thesis, 2011); Metin Yüksel, “On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra”, *Middle Eastern Studies* 52/4 (2016), 656–676; Metin Yüksel, “Oral Poets in Conflict: Aşık Veysel and Dengbêj Reso on the Rope”, *Journal of Folklore Research* 56/1 (2019), 71–103; Marlene Schäfers, “Being sick of politics: the production of dengbêj as Kurdish cultural heritage in contemporary Turkey”, *European Journal of Turkish Studies*, 20 (2015); Marlene Schäfers, “Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey”, *Comparative Studies in Society and History* 61/2 (2019), 447–473; Wendelmoet Hamelink, *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation* (Leiden: Brill, 2014); Clémence Scalbert-Yücel, “The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project”, *European Journal of Turkish Studies* 10 (2009); Canser Kardeş, *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi: Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme* (Ankara: Eğiten Kitap, 2017); Estelle Amy de la Bretèque, “Awazên (Dengên) Keserê: Axafînen Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de”, wer. Sinan Gültekin, *Wêje û Rexne*, 9-10 (2018), 57–78; Mehmet Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* (Stenbol: Avesta, 2013). Serdar Öztürk, *Di tradîsyona dengbêjiya Kurdî de Şakiro (Jiyan û Berhem)* (Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Mêrdîn, 2014).

15 Taybetmendiyên gerokbûna dengbêj ne ku bi tenê di nav dengbêjên Serhedê de heye, hin agahîderên li deverên kurdên elewî yên li Bazarcix û Depê diyar kirine ku berê dengbêjên ji Riha û Diyarbekirê bi ser piştên hespan deverên wan ziyaret kirine û li gundan ji wan re kilam gotine. Bin. Wendelmoet Hamelink, *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation* (Leiden: Brill, 2014), 42.

16 Bo nimûne, Dengbêj Kazoyê Garîsya li gundên Deştê Elaşgirê ji bo dawet û şahiyên hatiye vexwendin. Li vê herêmê gundek nemaye ku Kazoyê Garîsya neçûbe lê nebibe mêvan û çend sevan ji wan re kilam negotibe. Heta ew ne tenê gundên Elaşgirê geriyaye, li gelek gund û navçeyên Qerekilîsê (Agirî) geriyaye û gundên Kaxizmanê jî geriyaye ku wekî Newala Kaxizmanê tînin zanîn.

heta dawiya emrê xwe wan her tim mala xwe bar dikir.<sup>17</sup> Gelek sebebên van koçên dengbêj hene yên wekî ezimandina ji aliyê mezinekî ve, lihevnekirina bi gundiyan re, feqîrî û hwd. Helbet, ev koçberiya dengbêj bi rihetî pêk dihat ji ber ku dengbêj zêde bi karên çandiniyê re mijûl nedibû, gelemperî bi hunera xwe ve debara xwe dikir.

Dengbêj, di ger û geştên xwe de bi rêya danûstandinên bi dengbêjên din re repertuara xwe dadigire û kilaman di nav civatê de digerinê.<sup>18</sup> Zanîna wan a cografîk, bi taybetî zanîna wan a li ser navê gund, newal, zozan û golan bi gera wan re di nav gel de jî belav dibin. Navê şexs û cihên ku di kilamê de derbas dibin, nîşan didin ku vegêr û kesê ku qewam<sup>19</sup> bi xwe jiyaye çendî pabend in bi cografya û civata xwe re. Dengbêj ketine rêyên gundan ên gelek dûr da ku herin kilaman bi-bêjin û li ser wan rêyan gelek serhatiyên wan çêbûne û hin ji wan kirine kilam.<sup>20</sup> Ji ber ku wesayît tunebû dema ku dengbêj diçû cihekî gelek caran bi peyatî hin caran bi erebeyên ga an jî bi hespan diçûn. Di vê rewşa zehmet de, rêwîti dirêj dibû û dengbêj gund bi gund, çem bi çem topografya û toponîmên welatê xwe bi xwe tecrîbe dikir û hîn dibû bê ka çî gund hene li herêma wî ya nêzik û dûr û navê wan çî ne. Herwiha, zanîna dengbêjan a rê û bihurên di nav çiyayan de, çûyîna wan a li gund û mezreyên gelek dûr ên çiyayî nîşan dide ku wan di nav danûstandinên civatî yên xurt de hunera xwe îcra kirine. Bi taybetî, cografyaya lokal a ku dengbêj pê re girêdayî ye ji aliyê zanîna erdê ya fîzîkî û çandî ve ji teref dengbêj bi xwe ve tê bidestxistin. Ev tecrîbe û zanîna di afirîneriya kilam û mekanê kilamê de ji wan re dibe malzemeya vegêrana kilamê û dihêle ku ew qal û qewamê baştir nexşe bikin û bisêwirînin.

Dengbêj bi zanîneke xurt a toponîmîk ve kilamên xwe diafirîne û ew di heman wextê de, dema performansê xwe de, zanîna xwe ya toponîmîk vediguhêze cimaeta hazir û guhdar jî. Bi vî rengî zanîna berfireh ya li ser toponîmên dorhêla nêzik û dûr li dîwan û dawetan di nav gel de belav dibe. Kilam jî di devê dengbêj de dibe wekî amrazê nasyarkirin û xêzkirina nexşeya xeyalî ya kurdî û helbet ew dibe amraza fêrkirina toponîman û bi giştî jî topografyaya kurdî.

Dengbêj bîreke civatî ava dike û li hember xisara jibîrkirinê bi kilam û kelama xwe ve li ber xwe dide. Di nav kurdan de ji ber ku nivîs kêr bû, gelek qal, şer û qewam nedihatî tomarkirin. Dengbêj li hember talûkeya jibîrbûnê bi sedan salan li ber xwe daye. Lewre dengbêj warê sewt û qefesa xwe wekî kitab dibîne ku tê de serboriya civakî hatiye nivîsandin û ev kitab ji dengbêjên din re dikare bibe “kaxiz”, “qelem” û “defter” da ku ji ber bigirin û nedin jibîrkirin. Li vir, “çanda devkî” –dengbêjî– di asta vegêranê de bi rol û mayîndebûna “çanda nivîskî” –kitûk, kaxiz, qelem, defter– radibe; bi şewaz û stîla vê çandê ve kar dike û cextê dibe ser wê bîra hevpar ku bi ne-

17 Güneş û Şahin destnîşan dikin ku Dengbêj “Reso di 1951an de ji Gopala koç dike di rêzê de diçe Xêrgîs, Arincîk û Xoşgeldiyê û heta 1957an li van hersê gundên li ser navçeya Kopê dimîne. Di 1957an de dîsa vedigere Gopala û salekê lê dimîne. Paşê 1958an de li ser daxwazê mala xwe dibe gundê Koxakê ya li ser navçeya Kopê û heta 1963an li wir dimîne. Dîsa vedigere Gopala û sê salan lê dimîne. Di 1966an de mala xwe bar dike îcar diçe gundê Piyongê ya li ser navçeya Kopê, çar salan li wir dijî. 1970an de dîsa vedigere Gopala û heta 1972an li wir dimîne. 1972an de îcar koç gundê Qeraxlî ya li ser navçeya Kopê dike û çar salan li wir dijî. 1976an de ji ber sedemên aborî biryar dide biçê metropolên Tirkiyeyê. Reso bi tevî malbata xwe li bajaroka Golmarmarayê ya girêdayî navçeya Akhisar a Bajarê Manîsayê dimîne. (...) Piştê jî di sala 1980an de vedigerin Mûşê, gundê Pagê.” Ji bo gerokbûna Dengbêj Reso, bin. Güneş - Şahin, Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso, 29-30.

18 Ew carcar dema ku salixê kilamekê hildidin, ji bo kilamekê diçin gundên dûr û ji wî kesî kilamê berdigirin ê ku bi xwe ne dengbêj e lê mesele li ser wî qewimiye. Di hevpeyvînê de destebirakê Dengbêj Kazoyê Garisya, Hecî Mihemedê Ferman (Çaçan) behsa çiroka kilama “Porsor”ê kir û beşek ji kilamê got. Li gorî wî, dema ku kilam li ser hatibû derxistin û li ser zarê dengbêjan belav bibû, keça bi navê Porsorê hê sax bû û kesê ku kilam li ser hezkiriyê xwe Porsorê derxistibû, Ûsivê Huso bû. Dengbêj Kazoyê Garisya kilam ji ber Ûsivê Huso hildabû. Keçika bi navê Porsorê ji gundê Gulceyê ye ku li Kaxizmanê dimîne (Hecî Mihemedê Ferman, Hevpeyîna rûbirû, 22ê Îlonê, 2020).

19 Di vê nivîsarê de dewsa peyva “bûyer”ê peyvên wekî “qewimîn”, “qal” û “qewam” hatine bikaranîn ku bi naveroka kilaman re li hev dikirin. Ev yek bi zanebûn hate tercîhkirin.

20 Gelek kilam di encama ger û geştên dengbêj bi xwe de derdikevin. Bi taybetî hin dengbêj dema ku diçine cihekî serhatiyên xwe yên rê an jî dengbêjê ku li ser rê pê re dikevin leçe, serhatiyên wisa, dikin nav kilama xwe.

qilkirina devkî ya dengbêjan ve tê parastin. Ev nîşan dide ku dengbêj çandî bi bîr û şîyanweriya jiberkirina xwe bi “guman” in. Bo nimûne, kilama Evdalê Zeynikê bi devê Dengbêj Reso<sup>21</sup> wiha tê neqilkirin:

Ez Evdalê Zeynê Bavê Mihê me

Singê mi **kitûka dengbêjan e**

Zarê mi ji dengbêja ra **kaxiz û defter û qelem e lo yeman**”

Sing û bîra dengbêj dibe ew “kitab”a -kitûk- ku hemû qal û qewimînên giring tê de tîn tomar- kirin û ji bo dengbêjên din tîn neqilkirin. Qewimînên mezin lewma li ser zar û zimanê dengbêjan (ve)digerin û heyânî dinya xweş ava be dengbêj wê dikin “kilam û meqam”. Bi vî rengî zanîn û sermayeya çandî û dîrokî ya gel destedewrî nifşên bê dibe. Vansina ku li ser dînamîkên veguhastina “nerîta devkî” (*oral tradition*) ji nifşekî bo nifşeke din xebat kiriye, diyar dike ku nerîta devkî dikare hevterîb li gel çavkaniyên nivîskî kar bike û dîroka çandên nexwenda/bêsewad bide neqilkirin.<sup>22</sup> Kilamên dengbêjan ku parçeyekî wan ê giring ji qewimînên dîrokî pêk tê, rola veguhastina nerîta devkî ya çanda kurdî hildigirin ser xwe û wan derbasî nifşên nû dikin. Ango, sermaye û zanîna çandî di bîra gel de bi rêya nerîta devkî ya kurdî winda nabe û tê neqilkirin. Dema meriv di çarçoveya pênaseya rola veguhastina nerîta devkî ya Vansina de li kilama li jêr dinêre, meriv dibîne ku tespîten Vansina rasterast ji aliyê dengbêj ve di nav kilamê de hatine gotin. Ji ber ku haya dengbêj jê heye û dizane ku qal û şerê ku li ser vegêranê tê avakirin wê ji mezinan derbasî biçûkan bibe û neyê jibîrkirin. Heta dengbêj vê fonksiyona “veguhastina çandî ya di navbera nifşan de” di nav kilama xwe de dibêje û yek ji armancên kilambêjiya xwe jî bi vî rengî destnîşan dike. Lewma meriv dikare bibêje ku dengbêj wekî veguhêzerê nerîta devkî, bi xwe di ferqa rola vegêrana xwe ya hunerî de ye. Bo nimûne, di kilama “Dêran-Kejik”<sup>23</sup> de taybetmendî û rola kilam û meqamên dengbêjan bi terza Dengbêj Reso wiha tê ziman:

**heyânî dinya xweş ava be dengbêjê bikin meqam û kilam**

**li hevdu vegefrîn**

Rast e, dengbêj gelek qewamên dîrokî dikin “kilam û meqam”, bi saya afirîneriya wan pirên çandî di navbera nifşên berê û yên nû de tîn avakirin. Ew, demên ku dikevin navbera nifşan, bi veguhastina çandî û dîrokî digihin hevdu. Wate dengbêj di heman demê de qewimînên rastîn destedewrî nifşên nû dike ku meriv dikare bi çavkaniyên nivîskî jî piştrast bike. Têkildarî vê babetê Yüksel, bi xebata xwe ve hevgeriya vegêranên devkî bi qeydên nivîskî dipeyitîne û destnîşan dike ku di veguhastina dîroka kurdî de helbesta devkî (*oral poetry*) roleke giring werdigire<sup>24</sup> ji ber ku kilamên dengbêjan, ji aliyê mezinan ve ji bo biçûkan tîn neqilkirin anga pireke çandî û dîrokî ava dikin di navbera nifşên cuda de.<sup>25</sup>

21 Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso* (Nûbihar: İstanbul, 2019a), 258-259.

22 Jan Vansina, *Oral Tradition as History* (Wisconsin: University of Wisconsin Press, 1985)

23 Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*, 214.

24 Metin Yüksel, “On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra”, *Middle Eastern Studies* 52/4 (2016), 663.

25 Bo nimûne, di kilama Filîtê Quto de, di versiyona Dengbêj Huseynê Muşî de, dema ku behsa kuştina Filîtê Quto tê kirin, li ser mirina wî wiha tê gotin: “Lo lo lawo ca derbekî bavê(je) Filîtê Quto êtîmê Şemê, siwarê pêşiyê ew ê ser bi şemla / Heta dinya ava be, bira mezinê wir rabin piçûkên wir ra gelo çêkin mesele berxêê”. Mezinan rabûye ji biçûkan re şerê di navbera Filîtê Quto û Emê Etmankî de, kiriye mesele û meseleya dîrokî bi rêya kilam û meqamên dengbêj, ji nifşên berê heta nifşên nû hatiye neqilkirin. Ji bo deşîfrasyona heman kilamê bi hin ferqên biçûk, bin. Ömer Güneş - İbrahim Şahin, *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyn* (İstanbul: Nûbihar, 2021), 273.

### 3. “Topogeny”: Bi Seredorî Vegêrandina Navê Cihan

Navê cihan bi rengekî çalak li tev vegêranên kilaman dibin. Ew şekl û şêweza binyadî ya kilamê wekî kevirê qorziyê kar dikin û dibin bingeh û palpişt a ku carcar ber û meyla vegêranê diyar dike û wê li ser mekan bi cih dike. Lewma, ew ne tenê pêgeh û lokasyona şer û qewimînê dabîn dike, lê herwiha ew wan cih û waran nîşan dike ku têkilî û kartêkeriyên merivan lê gelek xurt bûne. Lê divê dorhêla fîzîkî jî neyê piştguhkirin a ku bi gelemperî piştî mekanê (navê mekanê) tê. Ango nav, bi xwe re mekanê temsîlkirî wekî dîmenekê dide xeyalkirin û kameraya vegêranê ji mekan ber bi karakterên li mekanê diguhêze ku di nav liv û tevgerê civatî de ne. Ev tevger û qewama civakî û çandî ku di kilamê de pêk tê, îşaretê bi bîreke civatî û hevpar dike. Îcar gelek fonksiyonên navan hene, hin ji wan ji aliye dêsmanî/binyadî ve kilamê birêkûpêk dikin, hin ji wan ji aliye wateyê ve li ser rehendên wekî bîr, jiyan, çand û civatê kar dikin.<sup>26</sup> Lewma di vê çarçoveyê de, ev beş van herdu aliyên navan dide ber xwe û wan rave dike. Gelek amrazên binyadî û çarçoveyî yên navan hene di nav kilamên kurdî de, li vir em ê tenê balê bikişînin ser têgiha topogenyê ku di nav kilamên kurdî de xuya dike.

Di hin kilamên kurdî de, ji mekanê destpêkê yê kilamê heta cihê armanckirî yê dawiyê (çi rêwîti an jî şopa kesê firarî) navê cih û waran bi rengekî seredorî di nav vegêranê de cih digire û li ser qewam, tevgerên civatî yên li ser mekan girêdanên hestî û bîranînê saz dike. Ev diyardeya kêmpayda hin vegêranên xweserî zimanê kurdî û dengbêjiyê derdixin meydanê ku di nav piraniya gelên cîhanê de nayê dîtin.

James J. Fox di kitaba xwe ya bi navê *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*<sup>27</sup> de diyar dike ku bi taybetî di nav wan gelên xwecih de ku bi zimanên avustronezî (*austronesian*) diaxivin navê cihan wekî parçeyekî navxweyî yê secereyê (*geneology*) tîn vegotin ku di nav wan stranên ayînî de meriv an jî tiştê (bo nimûne, birinc û garis), li ser erdê derdikevin rêwitiyekê li gorî rêzeke secereyî. Ew ji bo ravekirina pêwendiya di navbera erdê û dîrokê de bi rêya seredorî rêzkirina navê cihan, têgeha bi navê “*topogeny*”<sup>28</sup> saz dike, li gorî wî vegêranên wihareng zanîna civatî rêz dikin û wan vediguhêzînin. Di pêkhatina van *topogenyan* de, rêwitiyên şexsî jî dikarin bibin xwedî rol. Li gorî Fox çemka *topogeny*ê “vegotin/xwendina ji ber ya navê wan cihan e ku bi seredorî rêz bûne”.<sup>29</sup> Herwiha ew dibêje ku “*topogeny* dikeve gelek şekl û formên cihêreng di nav nifûsa avustronezyayê de. Ew dikarin rêwitiya bavûkalekî, koça grûpekî, an jî veguestina tiştêkî vebêjin”<sup>30</sup> Ew hevterîbiyekî (paralelî) di navbera secere û *topogeny* de dibîne, ji ber ku herdu jî bi seredorî navan rêz dikin. Bi xebatên etnografîk ve gelek fonksiyon û rehendên cihêreng ên *topogeny*ê bi gelemperî di nava wan gelan de hatine dîtin ku bi zimanên avustronezyayî (*austronesian*) diaxivin û li ser gelek welat û giravên cuda niştêcîh in.<sup>31</sup>

26 Nicolaisen di xebata xwe ya bi navê *Place-names in Traditional Ballads* (Navê Cihan di Baladên Nerîti de) de nîşan dike ku ji aliye teşenasîya *baladê* ve, navê cihan dikarin wekî amrazê binyadî (*structural device*) kar bikin. Li gorî wî rola navê cihan wekî hêmanekê binyadî di nav *baladan* de eşkere ye. Di xebata xwe ya li ser amrazên poetîk ên di vegêranên devkî û nivîskî yên gelê Navahoyê de, Webster vegêranên wawîkan ên nêritî dinirxîne û destnîşan dike ku navê cihan di wan vegêranan de mîna “amrazêke çarçovekirinê” (*framing device*) kar dike. Bin. Anthony K Webster, “Coyote poems: Navajo poetry, intertextuality, and language choice”, *American Indian Culture and Research Journal* 28/4 (2004), 69–91; Anthony K. Webster, “Aîk’idaa’ Ma’ii joollosh, jinî’: Poetic devices in Navajo oral and written poetry”, *Anthropological Linguistics* 48/3 (2006), 233–65.

27 James Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”. *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*. ed. James Fox, (Canberra: Pacific Linguistics, Research School of Pacific and Asian Studies, Australian National University, 2006), 89–100.

28 Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”, 8.

29 Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”, 8.

30 Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”, 8.

31 Tim Thomas, “Topogenic forms in New Georgia, Solomon Islands”, *Sites* 6/2 (2009), 92–118; Juniator Tulus. *Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai - Indonesia*. (Leiden University, Unpublished



Tulius diyar dike ku tevgerên koçeriyê yê bavûkalên gelê Mentawai bi rêya secere û topogenyê bi bîr dikevin.<sup>32</sup>

James Weiner di nav stranên helbestî yê foiyan (*Pagua New Guinea*) de formeke cuda ya topogeniyê tesbît dike. Ev stran ji bo bîranîna kesê mirî behsê tîne ser gelek rêze-cihên ku ew kes wextekî lê nêçîrvanî kiriye û bi rengekî gotarî di pêwendeke mekanî û demî de jiyana wî kesî ji nû ve saz dike.<sup>33</sup> Helbet, ev babeta *topogenyê*, ji serhatî û rêwîtiyên takekesî bigire heta koçberiya malbatî û eşîrî, ji wir heta tevgerên bavûkalan û ên rûhanî derheq gelek çalakîyên civatî de têkiliya di navbera meriv û erdê de jî diyar dikin.

Di nav kilamên kurdî de, ev têgiha ku Fox pêş xistiye bi çend cureyan ve tê dîtin û ev yek bi tena serê xwe ji bo lîteratura *topogeny* tiştêkî nû û giring e. Vegêranên di dilqê secere û *topogenyê* de zêdetir di nav gelên xwecih ên avustronezyayî tîne dîtin û ev diyardeya ku di nav kilamên dengbêjan de jî berdest e hin formên nû ên *topogenyê* jî bi pêş dixin. Di hin kilamên rêwîtiyê yê Evdalê Zeynikê de, bi taybetî di kilamên li ser rêwîtiya wî ya Xozanê de û di hin kilamên firarî û qaçaxiyê de formên gelek berçav ên *topogenyê* tîne dîtin. Di vir de, ji bo nimûneya *topogenyê* şaxeke kilama navdar “Elî Xarza” hate hilbijartin ku ji aliyê Gültekin<sup>34</sup> ve hatiye qeydkirin ji devê Dengbêj Kerem. Kilama “Elî Xarza”<sup>35</sup> an jî “Eliyê Xarziya”, li ser qewimîneke gelek trajîk hatiye çêkirin û ji aliyê dengbêjan ve -bi taybetî li Agiriyê (Qerekilîs)- hatiye gotin. Ev qewimîna vê kilamê di heman demê de bûye babeta hin nivîsarên bi kurdî jî.<sup>36</sup>

Meriv dikare vê qewimînê gelek bi kurtî neql bike. Du karakterê serekî yê vê kilamê hene ku şaxên kilaman li gorî wan wekî Xalo (Hemze) û Xarziya (Elî) ji hev cihê bûne. Elî Xarziya ji ber hin meseleyên ku berê pêk hatine, direve û diçe aliyê Îranê, li Makûyê bi cih dibe. Dewleta Osmanî bi casûsê xwe li pey wî dikeve û wî digire û tîne hepsa Bazîdê. Xalê wî Hemze bi vê yekê dihise û li rêyeke xelasiya wî digere. Elî Xarziya gelek îşkence jî dibîne û piştî wextan, dewlet dixwaze wî ji Bazîdê hilde bibe li Erziromê ceza bike. Hemze Beg ji bo xelaskirina Elî, ji destê eskeran ji hevalê xwe Îbo Begê alîkarî dixwaze û bi alîkariya Îbo Beg li tanga Deveboyniya li ser rêya Erziromê pêşî li eskeran digirin, serekê eskeran Sarîbînbaşî dikujin û direvin. Di rêya pişt Diharê re tê derbasî gundê Çatkosedaxê (li Elaşgirê ye) dibin û li wir Elî Xarziya tê kuştin. Xalê wî, Hemze wî hildide, tîne nêzîkî gundê Çerkez<sup>37</sup> dispêre axê. Aras destnîşan dike ku ev qewimîn bi texmînî di navbera salên 1888-1890an de pêk hatiye.<sup>38</sup>

Ev meseleya li seranserê Agirî, Qers û Makûyê û gund û deverên derdorê deng vedide û gelek dengbêjên navdar li ser xal û xarziyan kilaman derdixin.<sup>39</sup> Ahmet Aras diyar dike ku wî ji devê

PhD Thesis, 2012); Robert Wessing, “Telling the landscape: Place and meaning in Sunda (West Java)”, *Moussons* 4 (2001), 33–61.

32 Tulius. Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai – Indonesia, 28.

33 Vgz. Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”, 14.

34 Mehmet Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan* (Stenbol: Avesta, 2013), 215-226.

35 Di vê xebatê de navê kilamê wekî “Elî Xarza” hatiye bikaranîn ji ber ku Gültekin bi vî navî kilam bernivîsandiyê.

36 Ahmet Aras, “Du Nivîsên Nûbiharê”, *Nûbihar* 123/20 (2013), 39–42; Cevdet Kahraman, “Rêzenivîsek li ser hinek stranên Nêzdîroka Me-14: (Tew Dinyayê) Li ser Kilama ‘Eliyê Xwarziya û Têlî Hemze an jî Çemê Çetelê’”, *Kelha Amed* 19 (2013), 25–30.

37 Gundekî Elaşgirê ye.

38 Ji bo hûngiliyên vê qewimînê bin. Aras, “Du Nivîsên Nûbiharê”, 39-42.

39 Hin dengbêjên ku şaxên vê kilamê dibêjin ev in: Dengbêj Hecî Sêvdînê Remedana (Sêvdînê Hamê), Dengbêj Mihemedê Çêrmeliyê, Dengbêj Eliyê Mirad, Dengbêj Kerem, Dengbêj Mistefayê Cangoranê û hwd. Bi taybetî şaxa kurt a ku Kawîs Axa dibêje ya bi navê “Çemê Çetelê/Xalo” gelek bi nav û deng e. Herwiha birayê Dengbêj Mihemedê Çêrmeliyê diyar kir ku birayê wî ev kilam gelek xweş digot û şaxeke kin a vê kilamê wî bi xwe jî dizanibû (Muzaffer Yıldız, hevpeyîna rûbirû, 29ê Îlonê, 2020). Ji bilî van dengbêjan hin şaxên vê kilamê hatine tomarkirin. Şaxeke vê kilamê ji aliyê Ahmedê Hepo ve ji zarê Eliyê Ezîzê Rûto li Komara Azerbaycanê hatiye bernivîsandin. Herwiha Heciyê Cindî şaxeke heman kilamê ji zarê Keleşê Xelîl li Ermenistanê bernivîsandiye û

dengbêjê navdar Hecî Sêvdînê Remedana ev kilam tomar kiriye ku şaxeke dirêj e.<sup>40</sup> Ev kilama taybet, gelek taybetmendiyên balkêş nîşan dide. Bi taybetî, têgiha *topogenyê* ya Fox ji bo ravekirina bi seredorî rêzkirina navan a di nav vegêranê de gelek li vê kilamê tê.<sup>41</sup> Lê di kilaman de bi *topogeny* re taybetmendiya secereyê xuya nakin. Ji ber ku ruknê kilamê li ser rêwitiyeke di navbera Makû-Bazîd-Erziromê de ava bûye, li gorî şaxê kilamê cihê destpêkirina navê gundan diguhere. Di “Elî Xarza” ya Dengbêj Kerem de<sup>42</sup> bi tevî dubarekirinan 160 caran navê cihan derbas dibe ku gelemperî bi seredorî tîr rêzkin. Wate, rêzbûna van navan ne bi keyfî (*arbitrary*) ne lê ew li gorî rêwitiya karakterê kilamê li ser mekan tîr neqîşandin. Li gorî Fox vegêranên bi vî rengî zanîna civatî vediguhêze û bîrê li ser mekan bergewde dike.<sup>43</sup> Di kilamê de, parçeyek rêwitiyê wiha tê vegotin:

...

Ewê şevê îstereheta xwe dibîne  
Sibê ra du seet sibe dimîne  
Radibe teng û bera dişidîne  
Eynî di **Lêşko** ra, di **Gundê Pîrê** ra  
**Tîra Jorîn** ra, **Mîrxexan** ra, di **Ava Mesiya** ra  
Dajo dicedîne  
Gelo di **Nado** ra, tanga **Sînegê** ra  
Dajo gelo tanga Çamûlê ra  
Di **Nawîk**<sup>44</sup> ra gelo tanga **Aşqelê** ra  
Di Îza ra, di **Cimika** ra, **Kasorê** ra  
**Qeyabegê** ra, binya **Xaçilê** ra  
Di **kela Elaşgirê** ra, gelo Şadya  
**Remedana**, di **Gapira** ra  
Çû derkete orta **Parsînê**, gundek heye li Çatê dimîne  
Lo, lo, lo, lo<sup>45</sup>

Çawa di perçeya jorê ya kilamê de tê dîtin, di kilamê de rêzkirina navan ji gundê Lêşko<sup>46</sup> dest pê dike heta gundê Çat (Kosedax)ê tê. Li ser vê rêyê navê wan hemû gundan bi rêzeke seredorî (*ordered sequence*) tîr vegotin. Ji ber ku ev kilameke gelek dirêj e ne mimkin e ku meriv hemû navan li ser nexşeyekê bi cih bike. Lêbelê eger meriv beşa jor a kilamê bi rengêkê seredorî nexşe bike wê bê dîtin ku ew gundên ku hatine rêzkin bi gelemperî tevlihev nabin û bi rêzê navê wan derbas dibe (bin. Şikil 1).

Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl ji şaxeke vê kilamê tomar kirine. Ji bo van her sê şaxên kilamê bin. Ahmedê Hepo, *Karîbarên Gelê Kurd* (Ankara: Peywend, 2021), 25-39; Heciyê Cindî, *Folklorê Kurmanciyê* (Amed: Weşanên Lîs, 2016), 183-197; Ordîxanê Celîl - Celîlê Celîl, *Zargotîna Kurdan I* (Moskva: Neşîrxana Naûka, 1978), 268-278.

40 Aras, “Du Nivîsên Nûbiharê”, 40.

41 Helbet ne tenê ev kilam, bi dehan kilamên din ên kurdî heye ku tê de *topogeny* tê dîtin. Ji ber ku ev kilam vê taybetmendiye baş nîşan dide li vir ew hate hilbijartin.

42 Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mîrxasî û Serhildanan*, 215-226.

43 Fox, “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”, 8.

44 Navê gund Nawîk e ne ku Nawîk. Dibe ku bernivîsandinê de xeletiyek çêbibe.

45 Gültekin, *Zargotîna Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mîrxasî û Serhildanan*, 218.

46 Lêşko gundê Avkevîrê ye.



Şikil 1. Vegêrana topojenîk a ji gundê Navîkê ber bi Çatê

Dema ku li gorî rêzê navê gundan tên xêzkirin rêya ku karakterên kilamê tê re derbas dibin baştir xuya dike. Ferdên jor ên kilama Elî Xarza ku hema hema tenê ji navan pêk tê ji gundê Navîk dest pê dike ji wir bi seredorî gundên wekî Aşqe, Îz(iy)a, Cimika, Kasor, Qeyabeg, Xaçil, Kela Elaşgirê, Şadya, Remedana, Gapira û Çatê teqîb dike. Ev kilama bi navê cihan dagirtî gelek berbelav dibe û ji aliyê bi dehan dengbêjan ve tê gotin û heta di nav kurdên Ermenistan û Azerbaycanê<sup>47</sup> de jî şaxên vê kilamê tînin. Nimûneyên bi vî rengî yên ku taybetmendiyên *topogenyê* nîşan didin û bi navan çîrokan saz dikin kêm bin jî hene.

Bo nimûne Rosaldo diyar dike ku ji bo gelê ilongotê (bugkalot) yên li Fîlîpînê, navên cihan ên rêzkirî bi tena serê xwe wekî çîrok tînin hesabandinê. Li gorî gelê navbirî guhdariya wan navê cihan ên rêzkirî ku kesek lê geriyaye bi qasî vegêranê bikitekit çîrokek e (û nabe ku ji nav çîrokekê bê derxistin).<sup>48</sup> Di nav gelek gelên avustronezî de navê cihan bi tevî secereya bavûkalan tê veguhastin û çîrokên rêwitiyên malbatî di nav her kom û cemawerên eqreba de tînin û ev di nav malbatê de ji nifşekî bo yeke din tînin parastin.<sup>49</sup> Li gorî Tulus secereyên merivên eqreba yên ku pêkhatiyên giring ên çîrokên malbatî dihewînin û agahiyên li ser tevgerên koçberiyê û navên bavûkalan dikarin eqrebatîya wan û ya cînarên wan piştrast bikin ku niha ji hevdu cihê bûne û li deverêke din dimînin.<sup>50</sup> Lêbelê dîrokbêjiya devkî ya malbatî ku di nav kurdan de jî hin taybetmendiyên *topogenic* û secereyî dihewîne, mîna hin gelên avustronezî bi sînorên berteng ên secereyên malbatî re ne girêdayî ye. Belkî berevajî wê, çîrokên ku ji bo civatê balkêş bin û zêdetir derdikevin pêş belav dibin û dikarin sînorên xwe yên lokal bi rihetî derbas kin. Wekî çîroka rizgarkirina Elî ji destê dewletê û reva wan a bi wêrekî herçiqas wekî çîroka xal û xwarziyekî di nav sînorên malbatî de be jî, cihetên wê yên wekî li dijî derketina desthilatê û qaçaxî û firarîbûna wan dihêle ku çîroka wan ji sînorên dewletan jî derbas bibe.

Bi vegêrana ku li dor rêzkirina wan hemû navan tê avakirin, bîra vê rêwitiya wan bi pêzanînen

47 Ahmedê Hepo, *Karîbarên Gelê Kurd* (Ankara: Peywend, 2021), 25-39; Heciyê Cindî, *Folklorê Kurmanciyê* (Amed: Weşanên Lîs, 2016), 183-197; Ordîxanê Celîl - Celîlê Celîl, *Zargotîna Kurdan I* (Moskva: Neşîrxana Naûka, 1978), 268-278.

48 Renato Rosaldo, "Ilongot Hunting as Story and Experience", ed. Victor V. Turner - Edward M. Bruner, *The Anthropology of Experience* (Urbana and Chicago: University of Illinois Press, 1986), 106.

49 Bin. Tulus. Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai – Indonesia.

50 Tulus. Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai – Indonesia, 191.

mekan-zemanî pêşkêş dike û serhatiya lehengên kilamê ku hewl didin Elî Xarziya rizgar bikin bi navên rêzkirî ve îşaret dike. Çûn-hatina di nav kilamê de tim bi navê gundan ve tê vegêran, ew di van cure kilaman de ber û paşîya kilamê diyar dikin. Piştî ku Elî Xarziya tê kuştin, rêwitiya Hemze dewam dike heta ber bi gundê Xecxatûnê ku li hinda sînorê Çaldiranê ye. Di vegotina mirina wî ya trajîk de, dengbêj amrazên vegêraneke helbestî û retorîk bi kar tîne û mirina wî wiha pêşkêş dike:

Gelî cimaetê, sibe bû, *li geliyê Çatê<sup>51</sup> tav diziriqî*

Serê xarziyê li ser çoka xalê dixeriqî

Eliyê Xarza go, xalo, dilê min kîne-kîne

Wexta tu hatî bihar e, eva payîz e,

dar lê dixê dar çiloyê xwe diweşîne<sup>52</sup>

Ev kilama Elî Xarza ku nimûneyeke baş a vegêrana topojenîk e, gelek bi xurtî pabendî cografyaya çandî ya kurdî ye û wan sînorên di navbera kurdan de xêzkirî derbas dike û bi rêya vegêranê wan digihîne hevdu ji Makûyê heta Erziromê. Helbet gelek kilamên din ên bi vî rengî hene ku taybetmendiyên kilamên *topogenyê* nîşan didin, bi taybetî jî kilamên Evdalê Zeynikê. Dema ku pergala toponîmîk a kurdî bi rêya navguhertinê tê xerabkirin ku bi salane gelek nexşeyên curbicur û pirtebeqeyî yên qewimînên çandî û dîrokî xêz dike, pê re jî xisar digihe zanîna gelêrî ya kurdî.

### Encam

Navê cihan, tenê li ser tabelayên bajaran rê nîşanî merivan nadin, ew di nav zanîna çandî ya devkî de jî gelek bi xurtî cihê xwe digirin û dikarin di navbera meriv û mekan de pabendî û aidiyetê çêbikin. Zanîna giştî ya çanda gelêrî û pergala toponîmîk a ku ew çand pê re pêwendîdar e, bi gelek form û wateyên cihêreng ve barkirî ye. Lewma destwerdana ji aliyê desthilatê ve li ser zanîna toponîmîk û zimanî ya civatê çêdibe, zirarê dide wan têkiliyan ku civat bi mekan, raborî û zanîna bavûkalan re saz dike. Bi vî rengî, çîrok û serhatiyên raboriyê jî para xwe ji destwerdana li ser navê cihan digirin. Di çarçoveya toponimiyê de meriv bi hilsengandina vegêranên gelêrî dikare bergeh û berdiyeke giring dabîn bike ku pê têgihîştina civatê ya li ser navan baştir eşkere dibe.

Ev xebat destnîşan dike ku navê cihan wekî perçeyekî navxweyî yê çanda devkî ya kurdan, bi gelek fonksiyonên sosyo-kulturî ve radibin. Ew wekî amrazên veguhastina zanîna cografîk ya çanda devkî kar dikin ku pê re jî gelek peyama, qewamên dîrokî, bawerî û nirx li wan hatine barkirin. Bi taybetî, di nav afirandinên dengbêjan de, bi dehan nexşeyên devkî li bîra civakî tîna xêzkirin, bi vî karî, her kilamek bi rêya navê cihan ên ku tîna neqilkin, dibe xwedî nexşeyeke taybet a biçûk. Ev navên li ser van nexşeyên devkî, herçiqas li ser nexşeyên fermî nehatibin tomarkin û rayedarên fermî yên dewletê giringî nedabin wan jî, li diyarê çav e ku nirx û qîmeteke wan a mezin heye ji bo nerîta devkî ya kurdî. Di vê xebatê de hate dîtin ku di nav kilamên kurdî de, mefhûma *topogenyê* ku Fox (2006) pêş xistiye bi çend cureyan ve cih digire. Vegêranên di dilqê *topogenyê* de di nav kilamên dengbêjan de jî berdest e û hin formên nû yên *topogenyê* dihewînin. Bi taybetî kilama “Elî Xarza” (nêzî 160 navî dihewîne) ku taybetmendiyên gelek xurt ên *topogenyê* nîşan dide. Di kilamê de navê cih û waran bi rengekî seredorî di nav vegêranê de cih digire û li ser qewam, tev-

51 Gundeke li quntara Çiyayê Kosedaxê ye ku li Elaşgirê dimîne. Ev gund ji ber ku di nav geliyekî de ye wekî Geliyê Çatê derbas dibe herwekî ku di kilamê de jî wisa ye. Herwiha di vegêrana li ser rêwitiya Elî Xarza de ev qonax giring e ji ber ku Elî li vir tê kuştinê. Ji ber vê yekê ye ku gotinên gelek estetîk û xurt tîna derbirin li ser mirina wî.

52 Gültekin, *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*, 225.

gerên civatî yê li ser mekan girêdanên hestî û bîranînê saz dike. Kilama Elî Xarza û gelek kilamên din ên topojenîk nîşan didin ku qewimînên dîrokî yê li dor dîrokbêjiyêke toponîmîk tên vegêrandin bi awayekî mekanî li ser nexşeyên devkî diedilin û çî dema ku destedewrî nişên nû dibin nexşeya wê qewimînê û çîroka wan lehengên kilamê ji nû ve li ser mekan xêz dikin.

## ÇAVKANÎ

Amy de la Bretèque, Estelle. “Awazên (Dengên) Keserê: Axaftinên Melodîkirî, Zêmar û Vegotinên Lehengî di Nav Êzidiyên Ermenistanê de”, wer. Sinan Gültekin, *Wêje û Rexne*, 9-10 (2018), 57–78.

Aras, Ahmet. “Du Nivîsên Nûbiharê”, *Nûbihar* 123/20 (2013), 39–42.

Aras, Ahmet. Şairê Kurda yê Efsanewî: Evdalê Zeynikê. Stenbol: Nûbihar, 2018.

Assman, Jan. *Kültürel Bellek*. çev. Ayşe Tekin, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2018.

Basso, Keith. “‘Speaking with Names’: Language and Landscape among the Western Apache”, *Cultural Anthropology* 3/2 (1988), 99–130.

Basso, Keith. *Wisdom sits in places: Landscape and language among the Western Apache*. Albuquerque: University of New Mexico Press, 1996.

Berg, Lawrence D. - Kearns, Robin A. “Naming as norming: “Race”, gender and the identity politics of naming places in Aotearoa/New Zealand”, ed. Lawrence D. Berg -Jani Vuolteenaho *Critical Toponymies: The Contested Politics of Place Naming*. pp. 19–51. Aldershot: Ashgate, 2009.

Boas, Franz. *Geographical names of the Kwakiutl Indians*. New York: Columbia University Press, 1934.

Celîl, Ordîxanê - Celîl, Celîlê. *Zargotina Kurdan I*. Moskva: Neşîrxana Naûka, 1978.

Cindî, Heciyê. *Folklorê Kurmanciyê*. Amed: Weşanên Lîs, 2016.

Cruikshank, Julie ‘Getting the Words Right: Perspectives on Naming and Places in Athapaskan Oral History’, *Arctic Anthropology* 27/1 (1990a), 52–65.

Cruikshank, Julie. *Life lived like a story: Life stories of three Yukon native elders*. Vancouver: University of British Columbia Press, 1990b.

de Certeau, Michel. *The Practice of Everyday Life*. trans. Steven Rendall, Berkeley: University of California Press, 1984.

Feld, Steven. “Waterfalls of Song: An Acoustemology of Place Resounding in Bosavi, Papua New Guinea”, ed. Steven Feld - Keith Basso *Senses of Place*. pp. 91–135. Santa Fe, NM: School of American Research Press, 1996.

Fox, James (ed). “Genealogy and topogeny; Toward an ethnography of Rotinese ritual place names”. *The poetic power of place; Comparative perspectives on Austronesian ideas of locality*. pp. 89–100, Canberra: Pacific Linguistics, Research School of Pacific and Asian Studies, Australian National University, 2006.

Gültekin, Mehmet. *Zargotina Kurdên Serhedê: Kilam û Destanên Epîk ên Dîrokî, Mêrxasî û Serhildanan*. Stenbol: Avesta, 2013.

Güneş, Ömer - Şahin, İbrahim. *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*. Nûbihar: İstanbul, 2019a.

Güneş, Ömer - Şahin, İbrahim. *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar, 2019b.

Güneş, Ömer - Şahin, İbrahim. *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno*. İstanbul: Nûbihar, 2021.

Hamelink, Wendelmoet. *The sung home: narrative, morality, and the Kurdish nation*. Leiden: Brill, 2014.

Hepo, Ahmedê. *Karîbarên Gelê Kurd*. Ankara: Peywend, 2021.

Hunn, Eugene. “Columbia Plateau Indian Place Names: What Can They Teach Us?”, *Journal of Linguistic Anthropology* 6/1 (1996), 3–26.

Kahraman, Cevdet “Rêzenivîsek li ser hinek stranên Nêzdîroka Me-14: (Tew Dinyayê) Li ser Kilama ‘Eliyê Xwarziya û Têlî Hemze an jî Çemê Çetelê”, *Kelha Amed* 19 (2013), 25–30.

Kardaş, Canser. *Aşîğın Sazı Dengbêjin Sesi: Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme*, Ankara: Eğiten Kitap, 2017.

Kari, James and James A. Fall, (eds) *Shem Pete’s Alaska: The Territory of the Upper Cook Inlet Dena’ina*. Fairbanks, AK: Alaska Native Language Center, University of Alaska, 2003.

Kevirbirî, Salihê. *Filîte Quto*. Stenbol: Do, 2009a.

Kevirbirî, Salihê. *Sedsala Qêrînekê: Karapetê Xaço*. Stenbol: Do. 2009b.

Nicolaisen, W. F. H. “Field-work in place-name research”, *Studia Hibernica* 1 (1961), 74–88.

Nicolaisen, W. F. H. “Names as Verbal Icons”, *Names* 22/3 (1974), 104–110

Nicolaisen, W. F. H. “Place-names in traditional ballads”, *Folklore* 84 (1973), 299–312.

Oliveira, Katrina-Ann R. Kapā’AnaokalāOkeola NāKoa. “Wahi a Kāhiko: Place Names as Vehicles of Ancestral Memory”, *AlterNative: An International Journal of Indigenous Peoples* 5/2 (2009), 100–115.

Öztürk, Serdar. *Di tradîsyona dengbêjiya Kurdî de Şakiro (Jiyan û berhem)*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn, 2014.

Rosaldo, Renato. “Ilongot Hunting as Story and Experience”, Victor V. Turner - Edward M. Bruner, *The Anthropology of Experience*. Urbana and Chicago: University of Illinois Press, 1986, 97–138.

Scalbert-Yücel, Clémence “The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project”, *European Journal of Turkish Studies* 10 (2009) DOI : 10.4000/ejts.4055

Schäfers, Marlene “Archived Voices, Acoustic Traces, and the Reverberations of Kurdish History in Modern Turkey”, *Comparative Studies in Society and History* 61/2 (2019), 447–473.

Schäfers, Marlene “Being sick of politics: the production of dengbejî as Kurdish cultural heritage in contemporary Turkey” *European Journal of Turkish Studies*, 20 (2015) DOI: 10.4000/ejts.5200

Thomas, Tim (2009) “Topogenic forms in New Georgia, Solomon Islands”, *Sites* 6/2, 92–118.

Thornton, Thomas “Anthropological Studies of Native American Place Naming”, *American Indian Quarterly*, 21/2 (1997), 209–228.

Thornton, Thomas F. *Being and place among the Tlingit*. Seattle: University of Washington Press, 2008.

Tulius, Juniator. *Family stories: Oral tradition, memories of the past, and contemporary conflicts over land in Mentawai - Indonesia*. Leiden University, Unpublished PhD Thesis, 2012.

Vansina, Jan. *Oral Tradition as History*. Wisconsin: University of Wisconsin Press, 1985.

Webster, Anthony K. “‘Ałk’idaa’ Ma’ii jooldlosh, jini’”: Poetic devices in Navajo oral and written poetry”, *Anthropological Linguistics* 48/3 (2006), 233–65.

Webster, Anthony K. “Coyote poems: Navajo poetry, intertextuality, and language choice”, *American Indian Culture and Research Journal* 28/4 (2004), 69–91.

Wessing, Robert, “Telling the landscape: Place and meaning in Sunda (West Java)”, *Moussons* 4 (2001), 33–61.

Yüksel, Metin “On the Borders of the Turkish and Iranian Nation-States: the Story of Ferzende and Besra”, *Middle Eastern Studies* 52/4 (2016), 656–676.

Yüksel, Metin “Oral Poets in Conflict: Âşik Veysel and Dengbêj Reso on the Rope”, *Journal of Folklore Research* 56/1 (2019), 71–103.

Yüksel, Metin. *Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival and Revival of the Kurdish Kurmanji Language in the Middle East, 1925-1960*. University of Chicago, Unpublished PhD Thesis, 2011.